

Li hemberî gefên Tirkîyê, divê kurd yekhelwest bin



PEYVA WELAT

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- MehaneSernivîser:
Aras YûsivDesteya rêvebir:
Imran YûsivDizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Li hemberî gefên Tirkîyê, divê kurd yekhelwest bin

Desteya sernivîs

Îro roj ji hemû deman bêtir desthilatdarên dewleta Tirk a dagîrker bi serokatîya Erdogan di rewşa harbûnê de ne, û li ser dagîrkirina rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyê rîjd in. Armanca wan ewe ku careke din gelê Kurd bidin qirkirin û wî ji maf û azdîya wî bêpar bikin.

Em tev dizanin ku dîroka dewleta Tirk derbarê doza kurdî de dîrokeke xwînî ye û dîroka dijminahîyê ye, hişmendîya netewperestên Tirk qet mafê gelê kurd nasnake û bi ti awayî napejirîne û kurdan wek dijminekî hebûnî ji xwe re dibînin, ev sed sal bêtir ev hişmendî qet nehatîye guhertin.

Sebareti netewperestên tirk, kurdê qenc û baş ewe yê mirî be an yê peyrewê wan be, ev nêrîn di çanda wan de bîr û bawerî ye. ezmûna dagîrkirina Efrînê jî li ber çavan e.

Li hemberî dijminekî hewqas hov û bêwijdan, û ji bo rêgirtina li ber dagîrkerîya wî, çi ji gelê kurd û tevgera wî ya siyasî tê xwestin ?

Mixabin, heya îro roj helwesta gelê kurd li herçar parçên Kurdistanê û li cîhanê derbarê gefên dewleta Tirk li ser rojavayê Kurdistanê di asta herî nizim de ye. Bêguman tevgera siyasî ya Kurdistanî di ber vê yekê de sûcdar e. Gelo ew li bendî çi ne da ku rabin ser pêyan û helwesta xwe li hemberî gefên rêjîma tirk a faşîst li pêşberî cîhanê dîyar bikin! ma ew li bendî ne ku artêşa tirk dest bi êrîşê bike !?

Îroj berî sibe, divê çalakîyên şermezarkirinê û redkirina gefên dewleta Tirk bîne destpêkirin, ev

çalakî li hundirê herçar parçên Kurdistanê û li seranserî cîhanê divê bîne lidarxistin. Îroj ji hemû cîhanê re hatiye dîyarkirin ku şervanên kurd di ber tevahîya cîhanê de şerê terora Daişê kirin û di wî şerî de bi ser ketin, û bi hezaran qurbanî di ber mirovahîyê de dan. Divê sûde ji vê xala herî bi hêz bê wergirtin û gelê kurd vê xalê di çalakî û xwepêşandanan de bide riwê raya giştî ya cîhanî û dewletên zirhêz da ku bi berpirsîyarîya xwe ve rabin û gelê kurd ji terora dewleta Tirk biparêzin.

Ev şerê ku îroj tirk tînin ber derîyê me şerê hebûn û nebûnê ye, çiku ew dixwazin kurdan ji holê rakin û wan bi carekê re qirbikin, lewre divê em bi zanebûn û hişiyarî nêzîkahîyê li van gefan bikin û nehêlin ku pîlanên dewleta Tirk di ser me re derbas bibin. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



ÇAWA EZ Ê XWENDEKARÊ/A BÊCIR Û XWEDÎREFTARÊ NEBAŞ BI RÊ VE BIBIM?

Nêçîrvan Rojava

Di milê perwerde û fêrkirinê de û di çi pêvajoyê (seretayî, navîn, amadayî) de be jî tekez dê mamoste rastî xwendekarekî were ku pola wî tevlihev bike û bandorê li birêveçûna perwerdeyê bike. Jixwe em tev tuşî wî kesî hatine, ê ku her dem bi kiryarên nebaş wane û dersa me xirab dike û dibe ku ew kes bi xwe bin. Îcar di vê rewşê de wekî mamoste ez ê bi çi rêbazê danûstandinê bi xwendekarekî wiha re bikim, ta ku ez bikaribim encama herî baş a karê xwe bi dest bixim?

Dema tu waneyê didî, divê dengê wî were ku mijarek bi hevalê xwe re vekirîye û wane ji bîr kiriye. Helbet gelek caran bi dengê bilind kenîyaye, bê ku tu sedem hebe. Bela xwe li vî xwendekarî û yê din dixê. Leqeban li hevalên xwe tîne û dijûnan dike. Herweha di perwerdeya xwe de qels e. Bi giştî xwendekarê bêcîr xwediyê van reftaran e.

Jixwe ji ber ku salên pêşîn ji temenê mirov kesayeta wî saz dikin, loma pêvajoya ku dihêle xwendekar karên baş û xirab ji hev derxe, ya seretayî ye. Dêmek berî her tiştî divê xwendekar reftar û karê baş û nebaş binase û cudahiyê bixe navbera wan. Piştî mamoste dikare dest bi çareyê bike. Çare jî helbet li hin bikaranîn û gavan dabeş dibe. Dibe ku gelek rê û rêbaz ji bo vê babetê hebin, lê em ê hewl bidin ên herî girîng rêz bikin:

Nermbûn

Xwendekarê bêcîr helbet li malê jî bêcîr e û tekez dê li malê ji hêla dayîk û bavê xwe ve tuşî lêdan û lêxistinê hatibe. Lewre danûstandina bi heman nêzîkatîyê dê tu encamê nede der. Lê belê nermbûna danûstandina pê re dê bandoreke erênî û yekser li derûniya wî/wê bike û rê li ber pêxistina reftarên wî xweş bike.

Çandina rihê berpirsyariyê di kesayeta wî de

Ji ber reftarên wî, hevalên wî jê dûr dikevin û her kes wî bêsûd û neberpirsyar dibîne, bi vê yekê bawerîya wî bi kesayeta wî namîne û li hemberî derdorê bertekine xirabtir dide diyarkirin da ku balê bikişîne li ser xwe. Ji lew re erkdarkirina wî bi hin karan çî qas biçûk û sivik jî bin, dê baweriyekê li gel çêke û bihêle ku bi giraniya rola xwe li dibistanê bihise. Herweha dê xwe weke berpirsyar li hember karên pol û dibistanê bibîne. Jixwe wekî hate diyarkirin kar çiqasî sivik be jî lê bandoreke wî ya erênî heye; karên wekî: “Raman, ji kerema xwe re pênuşekê ji min re ji birêveberiyê bîne” “Hêvî, vê lûnûsê ji vî mamosteyî re bibe” û hwd.

Tevlikirina wî li nav hevalan

Wekî ku hate diyarkirin, ji ber reftarên wî, heval û hogir wî red dikin. Bi vê yekê rewşa wî aloztir dibe ku bi kêmaniyê dihise. Di vê rewşê de divê mamoste hewl bide ku wî tev li hevalên wî bike. Ew jî bi rêya sazkirina komekê ji xwendekaran ji bo peywireke bijartî ku ew endamê wê komê be û erkdarkirina wî bi karekî destnîşankirî, weke hemî endamên komê. Bi vê hem xwe wekî hevalên xwe dibîne hem jî wateya hevkarî û danûstandina bi hevalan re dinase.

Naskirina sedema wî reftarî

Divê têkilî bi xwendekar re û bi tena wî bê kirin, da ku sedemên wî reftarî bên naskirin. Helbet xwendekar dê sedeman ji te re diyar neke, lê di nav axaftin û gotinên wî de sedem veşartî ne. Herweha divê bi hezkirina mamosteyê xwe bihise ta ku dilê xwe jê re veke, lewre bêhineke fireh ji mamoste

tê xwestin ta ku xwendekar rihetiyekê li hember wî bibîne.

Curandina xwendekaran

Şaşîtiya ku mamoste bike, curandina xwendekaran li gorî baş û xirab/jihatî û lawaz e. Lê belê divê curandin li gor reftarên wan be her wekî: reftara “baş”, reftara “nelicîh” û “reftara ku nayê pejirandin”. Herweha divê bizane ku reftarên wî nayê pejirandin, ne kesayeta wî. “Ciwan tu pir baş î, lê ev karê te ne licîh bû”

Xelatkirin û darizandin


Her ku xwendekar kiryareke baş kir, çendî biçûk be jî divê were xelatkirin; da ku ber bi reftarên baş ve here. Lê divê karê baş bi xelatê ve girêdayî nemîne, da ku ne ji bo xelatê ew kar bê kirin, herweha hin bi hin xelatkirin kêmbibe ta ku nemîne. “Pêlîn, te pir baş kir; tu hêjayî vê xelatê yî. Bijî!”

Dema dubarekirina şaşîtiyan, ji neçarî divê

darizandin hebe. Lê belê divê ne lêxistin û lêdan be û ne jî biçûkirin be çimku bandoreke pir xirab li derûniya xwendekar dikan. Herweha eger soza vegera ji şaşîtiyê da ciza jî nemîne ta ku derfetek jê re çêbe ku li xwe vegere. “Baş e Lewend, ez piştrast im ku êdî tu hew vî karî dikî”

Helbet çarekirina pirsgerêkê û mijarên wiha, ne hêsan e û pêdiviya wê bi karekî giran heye. Herweha encam jî zû bi zû nayên. Lewre divê mamoste bi lez destê xwe ji xwendekar neşo û vîna wî di arastkirina wî xwendekarî de ber bi reftara baş de xurt be. Tekez ev erk li ser milê malbatê ye jî ku bi hevkarîya mamoste bihêlin ku zarokê/a wan vê pirsgerêkê derbas bike. Dibe ku pêkanîna van gavan ta asteke zor be jî lê ji bo ku perwerdeyeke baş û tevgir peyda bibe, divê ev astengî werin derbaskirin. ■





EREBÊ ŞEMO YE! ÂN MÎR CELADET E!?



Ziyad Hisên

Bê guman li seranserê cîhanê, her neteweyek rojeke taybet ji zimanê xwe re veqetandiye û weke roja pîrozkirina zimanê xwe daye ragihandin. Zimanê kurdî jî yek ji wan zimanan e ku xwedî rojeke taybet e û her sal tê pîrozkirin, ew roj jî 15ê Gulana 1932yan e. Em tev dizanin ku di vê rojê de Mîr Celadet Alî Bedir-Xan cara yekem Kovara Hawarê bi alfabeya latînî weşand. Bê guman avêtina vê gavê destpêkirina qonaxeke nû di zimanê kurdî de bû. Lê pîrsa gelek ew e ku gelo Mîr Celadet e yê ku yekem car bi alafebeya latînî nivîsandiye, gelo ne Erebê Şemo ye yê ku dest bi vê gavê kiriye?

Di destpêka sedsala 20an de ku serdema ronesansa kurdan bû, êdî rewşenbîrên kurd û hezkerên zimanê kurdî gelek hewldan kirin ji bo ku alfabeyeke nû ku bi deng û taybetmendiya zimanê kurdî re guncaw be, saz bikin. Yek ji van hewldanan sazkirina alfabeyekê li gor tîpên latînî bû. Jixwe weke ku dîrok destnîşan dike alfabeya latînî ji berî 2700 salî ve tê bikaranîn û ji berbangê ve hetanî sedsala 19an piştî zayînê di warê bazirganî, teknîkî û ramyariyê de şeweyek ji şeweyên pêşketina şaristaniyê bû. Ronakbîr û

wêjevanên kurd ên sedsala 20an, bi şaristaniya dewletên rojavayî bandor bûbûn, loma gelek ji wan ji sedsala 19an ve hewl da ku tîpên latînî di nivîsa kurdî de bi kar bînin. Her hewldanek encamine cuda bi xwe derdixist. Yek ji wan hewldanan ew bû ku sazkerê kurdolojiya li Rûsiyayê "Biyoter Lêrx" dixwest alfabeyeke kurdî ku li gor tîpên latînî be, saz bike. Lê hewldanên wî, ji ber ku desthilata qeyserî ev yek paşguh kir, bi ser neketin. Eleksender Java jî hewl da ku tîpên latînî di zimanê kurdî de bi kar bîne. Ebdilrehman Cewdet jî girîngî da vê alfabeyê û li ser hevalên xwe yên rewşenbîr pêşinyar kir ku vê alfabeyê bi kar bînin. Cewdet di kovara "Rojî Kurd" de di sala 1913an de gotarek der barê vê mijarê de weşand. Jixwe çend mijarên kurdî bi vê alfabeyê di wê kovarê de hatin weşandin. Komeleya "Hêvî" ya xwendekarên kurd jî çend hewldan kirin da ku alfabeyeke kurdî li gorî latînî ava bikin. Her wiha zimanzanekî bi navê "Major E.B Soane" alfabeyeke latînî ji zimanê kurdî re amade kir û du pirtûk di vê der barê de nivîsandin, lê ev alfabe weke ku dihat xwestin di nav kurdan de belav nebû.

Em bîrên nik profîsorê kurd Erebê Şemo anku Şamîlov. Şemo yekem kurdekî soviyetî bû ku bawernameya bilind bi dest xistibû û ji Peymangeha Rojhilatnasiyê di sala 1924an de li Moskovê derçûbû. Ferweriya Rûsiyayê di sala 1925an de Erebê Şemo erkdar kir ku alfabeyeke kurdî li gor tîpên latînî, ava bike. Şemo piştî xebateke domdar karîbû di demdirêjiya du salan de anku di sala 1927an de alfabeyekê ava bike. Paşê ev alafebe raberî rojhilatnasê ermen "Orbêlî" kir. Piştî "Orbêlî" baş lê nihêrt û lê koliya, qewîtiya bikaranîna wê kir. Paşê demlîdest pirtûkên fêrkinê û yên wêjeyî bi

vê alfabeyê hatin nivîsîn. Her wiha rojnameya "Riya Teze" jî weşana wê bi tîpên vê alfabeyê bû. Hin tîpên vê alfabeyê di latîniya kurdî de ya ku îro tê bikaranîn, nînin. Bikaranîna vê alfabeyê di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de hat rawestandî û alafabeya kirêlî li şûna wê bi cih bû.

Der barê alfabeya ku îro tê bikaranîn de, Mîr Celadet Bedir-Xan amade kiriye, ew jî piştî kedeke mezin ku "Rocer Lots" jî pê re alîkar bû. Mîr Celadet Bedirxan sedema nivîsîna vê alfabeyê bi çîrokekê şîrove dike û wisa dibêje: "Alfabeya ku niha em pê dinivîsin, encama xebateke demdirêj e. Di sala 1919an de dema ku me Çiyayê Melatîyayê derbas kir, em rastî êla "Reşwan" hatin. Wê gavê efserê îngilêzî "Niwêl" yê ku zaravayê soranî baş dizanî bi me re bû û hewl dida ku zaravayê kurmançî jî fêr bibe. Loma çî peyvên ku bi me re derbas dibûn, dinivîsandin. Her wiha min jî gotinên pêşîyan û çîrokên ku bi me re derbas dibûn, dinivîsandin. Carinan em li tiştên ku me nivîsîbûn, vedigeriyan, da ku sererast bikin. Li vir tiştêkî bala min kişand; min dît ku "Niwêl" bi hêsanî û bi awayekî zelal, lê bi devokeke biyanî, dixwend. Lê dema ku min dixwend, min di xwendina tîpên "û, o, î, ê" de bi alfabeya erebî gelek astengî dikişandin. Ji ber vê yekê, di heman dema ku ez ji xwendina efser "Niwêl" de matmayî dimam, min hewl dida ku sedema giraniya xwendina xwe nas

bikim. Paşê min nas kir ku efser "Niwêl" bi tîpên latînî dixwîne û dinivîse, lê min tîpên erebî bi kar tanîn. Ji ber vê yekê min biryar da ku alfabeyeke kurdî bi tîpên latînî amade bikim." Bi vî awayî Mîr Celadet alfabeyek di sala 1929an de afirand û li gor zimanê kurdî sazûman kir, ew jî ew alfabe ye ya ku îro di zaravayê kurmançî de tê bikaranîn. Mîr Celadet ne tenê alfabe danî, lê belê rêzimana kurdî ya taybet bi zaravayê kurmançî jî danî. Mîr Celadet di 15ê gulana 1932yan de Kovara Hawarê ya ku ji 57 hejmarî pêk tê weşand. Di vê kovarê de rewşenbîr û wêjevanên kurd ên wê demê gelek mijarên cihêreneg tê de diweşandin. Jixwe Mîr Celadet jî mijarên rêzimana kurmançiyê tê de diweşandin.

Bê guman alfabeya ku Mîr Celadet saz kir encama xebat û hewldanên gelek zanyarên kurd bû. Hewldana Mîr Celadet cihê xwe di nav kurdan de girt û hetanî roja îroyîn jî belavbûyî ye. Lê ev nayê wê wateyê ku alfabeyên din ên ku cihê xwe di nav kurdan negirtin û belav nebûne, tu girîngî û rola wan nîne. Her hewldanek tevî yeke din dibû û tev di nav hev de bûn bingeş ji hewldanekê re û ew bi ser xistin. Erebe Şemo û Mîr Celadet her yekî ji wan hewldanên xwe kirin û her du jî bi ser ketin; xebat û keda Şemo di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de rawestiya, lê xebat û keda Mîr Celadet hetanî niha jî berdewam e. Ez dikarim di dawiyê de bibêjim ku Mîr Celadet berdewamiya Mela, Feqî, Xanî û Şemo ye. ■

تنمة المقال: الكلمة .. أفق وارتقاء

.. بالكلمة الطيبة ندعو إلى التفاعل مع قضايا الأمة ، ونعبر عن امتناننا للناس .

بالكلمة الطيبة نصلح بين الناس ، ونعدل بينهم بشهادة الحق ، وندفع الظلم بالعدل ، والسوء بالإحسان . بالكلمة الطيبة نقدم التصحح للآخرين ، ونعلم جاهلاً ، ونرشد تائهاً ، ونذكر غافلاً ، ونقدم رأياً صائباً ، ونقترح فكرة حسنة .

بالكلمة الطيبة نشجع مواهب الناشئة من أبنائنا وبناتنا ، ونأخذ بأيدي الطلبة على مقاعد الدرس ؛ ببث روح الثقة والدعم المعنوي والهداية إلى الصواب .

أخيراً : فتش عن الكلمة الجميلة في بطون الكتب ، وفي أحاديث الناس ، وفي أهزاج الألحان ، وابحث عنها بين محفوظاتك ، وفي متن قاموسك ، وحاول أن تؤدّي بها ما يهرك من مشاعر ، وما يخامرك من أفكار ، وما يأخذك من معان ، ولا تغترّ بالكلمة الزائفة ، فإذا ظفرت بالكلمة الجميلة ؛ فاجعلها تحفة في بيتك ، وزهرة في حديثك ، ونعمة في أسلوبك . ■

من مواقع الرّيف والضّلالة ..

الكلمة المسؤولة النّديّة ، واللّفظه الصّادقة الورديّة ، تهفو بالأرواح إلى جلائل الأمور بمحبة وأمل ، وتلك هي الدّعوة النّافعة ، وتلك هي الحكمة الماتعة .

الكلمة الطّيبّة تصفّي القلوب ، وتصلح النفوس ، وتذهب الحزن ، وتزيل الغضب ، وتشعر بالرّضا ، ولاسيما إذا رافقتها ابتسامة صادقة . والكلمة الطّيبّة تنبّي الرّزق ، وتصل الرّحم ، وتنسى في الأجل .. الكلمة الطّيبّة سمة الدّعاة والمؤمنين . الكلمة الطّيبّة تخرج الحيّة من جحرها .

وصياغة الكلمات فنّ .. فنّ نحتاج إلى إتقانه ، وعلم نحتاج إلى تعلّمه .. نحتاج إلى ذلك في خطابنا الدّعوي ، وفي عملنا الرّبوبي ، وفي توجّهاتنا التّعليميّة .. إذ لا شيء يخرق القلوب كلطف العبارة ، وبذل الابتسامة ، ولين الخطاب ، وسلامة القصد ..

بالكلمة الطّيبّة ندعو الناس بأحبّ الأسماء إليهم وأوقعها في نفوسهم

الكلمة .. أفقٌ وارتقاء



بقلم : علاء الدين حسن

قضية

تنطوي على الثور والحكمة والحياة ، وتبعث على الرحمة والهداية والنجاة .. هي مجد دنيانا ، وما أبلغ ، هي عنوان ثقافة ، وثقافة روح إذ هي ، في تراكمها على مدى التاريخ حضارة ، والحضارة نتاج علم وعمل ، أي نتاج سلسلة طويلة من عطاءات الأيدي والعقول .. تلكم هي مسؤولية الكلمة في أجلى حقائقها ، وأميز دقائقها ، سمعاً وكتابة ونطقاً وإصابة .

وقد سعت الإنسانية - منذ نشأتها وإلى يومنا هذا - للصّدد بالكلمة المسؤولة . ولو عدنا إلى تاريخ الرسالات ؛ لوجدنا أنّ الأنبياء والرسل أمروا وأمروا بالكلمة الطيبة التي تحفظ الحقوق ، وتحقق المحبة بين الناس .

الكلمة : الكلمة لفظة ذات حدّين ، ورسالة ذات ضدّين ؛ فهي - إن أردتم - شمس مشرقة أو نار محرقة ..

الكلمة هي باعث الشرور أو نذير الثبور ، وكم من كلمة قالت لصاحبها : دعني .

والكلمة قد تكون كالرصاص ، أو كاللدخان الأسود الذي يحجب الرؤية ، وقد تكون كالسراب الذي يحسبه الظمآن ماءً ، وقد تكون الكلمة أفقاً يحقّق أرقى النتائج ..

الكلمة مفردة التخاطب والإعلام ، وبريد القلب والإحساس ، ونبض النفس والمشاعر ، وشاهد الضمير ، ولسان القضاء ، ورسول المعرفة ، وأداة العلم والبيان ..

الكلمة هي شعار قائلها ، وسرّ خلوده ، ومناط ثوابه وعقابه .. وقد تتحوّل إلى صرخة استغاثة ، أو بارقة أمل ، أو لمسة حانية ، أو شهادة وفاء ، أو عبارة اعتذار .. وكلّما كان الإنسان أنيقاً في اختيار عباراته ، كان أكثر قبولاً في أوساط الناس ، وأعظم تأثيراً في حياتهم . الكلمة بكلّ حدودها ومعانيها مسؤولية كبيرة ، والتزام أدبي وأخلاقي يصوغها الفكر الناضج ، والنوايا الحسنة .

والكلمة حينما ترتقي إلى هذه السّمات ، وحينما تطوّقها ملكات الإرادة الشخصية المتمكنة القادرة على وضعها في إطارها الصحيح ؛ فإنّها عند هذا الحدّ تزهو بجمالها ، وتصل إلى هدفها بيسر وسهولة . الكلمة حتف ، أو شرف .. هدم ، أو بناء .. الكلمة بداية السّلم وبداية الحرب .. فكم من كلمة أضحكت وأخرى أبكت ، وكم من كلمة انشّرت لها الصّدر وأنس بها الفؤاد ، وأخرى انقبضت لها النفس وألقت قائلها أو سامعها في شدّة أو ضنك ، فضاعت الدنيا على رحبها والأرض على سعتها ، وكم من كلمة واست جروحاً ، وأخرى أحدثت حروقاً .

وكم من كريم بكلمة واحدة صار غرضة للملام ، وزمناً لحقّه في عرّضه ودينه الاتّهام ، ورُبّ كلمة أشعلت فتنة بين الأنام ، وزال بها ملكٌ واتّشك بها عرضٌ حرام ، وكم من كلمة فرّقت بين الأجيّة ، بعد كريم عشرة ، وكم من ظلم وقع على الأبرياء من العباد ، بسبب كلمة

تلقّفها سفهاء الأحلام .

فما أجمل الصّمت في حينه ، وما أجمل الكلام في حينه .. وليس الشّأن أن تجيب أو تتحدّث ، ولكن أن توظّف الكلمات وفق مقاصدها .

وبترك الفضول تكمل العقول ، والخرس خيرٌ من التّفوّه بالباطل ، والبكم خيرٌ من التّطقي بالكذب والرّور ، وشترُ النَّاس مائلٌ بمقاله مُبطل بكلامه ، وعثرات القول طريقُ النّدم ، والمنطق الفاسد الذي ليس له عنوانٌ دليل الحرمان والخذلان .

الكلمة مشروعٌ ثقافيّ ، نقلت الإنسان من ظلمات الظلم إلى أنوار العدل .. الكلمة قراءة ومعنى .

وعندما نزل الوحي لأوّل مرّة قال : [اقرأ] .. القراءة كلمة ، والكلمة علم وارتقاء ، شراع يقاوم العاصفة ، مركب نحمله الآمال ؛ كي نؤدّي رسالتنا بأمانة .

الكلمة حياة ؛ أو قل : هي قلعة شامخة .. وتقدّم الإنسان متلازم مع القراءة الواعية للواقع . بالكلمة المتزّنة نتقدّم ؛ لأنّها منطلق إلى كلّ هدف سام ، وقد أمرنا الخالق بالقول السّديد ، وهو القول الصادق الذي يُراد به الوصول إلى الحقّ .

وقوّة الكلمة لا تنطلق من مدى تمكّن صاحبها صوتاً ونطقاً وإلقاءً فحسب ، ولكنّها تنطلق من الصّديق الذي يُعدّد وقودها الأوّل .

قوّة الكلمة نتيجة لروح متوثّية ، وقلب خافق ، ولهجة صادقة ، وتأتي بعد ذلك البلاغة والبيان وحسن الأداء ؛ للوصول إلى أرقى درجات التأثير . ويُعرّف عن الحكماء قولهم : ليكن مرجعك إلى الحقّ ، وليكن منزعك إلى الصّديق . وقال الرّاشد الثاني : « عليك بالصّديق وإن قتلك » .

وللصّديق في الأقوال والأفعال والأحوال والأعمال منزلة رفيعة تميّز أهل الإيمان من أهل التّفاق ، وهو وعد الله بأرضه ، ما واجه باطلاً إلّا ردّه ، ومن نطق به علت على الخصوم كلمته ، فهو روح الأعمال ، ومحكّ الأحوال . وللصّديق بواعث ، ومنها : المروءة والعقل ...

عَوْدُ لِسَانِكَ قَوْلُ الصّديق تَحْطُ بِهِ إِنَّ الْبَسَانَ لِمَا عَوَدَتْ مُعْتَادُ وللصّديق نتائج ، منها : تحقيق طمأنينة القلب وسكن النفس وهدأة الرّوح .

والصّديق يفتح الطّريق للارتقاء والعلوّ ، فمن يحدّث نفسه يضطرب ويضلّ الطّريق الصّحيح ، أمّا الإنسان الذي يقف مع نفسه وقفة صادقة ، فإنّه يستطيع أن يركبها بالرّفق واللّين ، ولا يُحمّلها فوق طاقتها .

ومن آثار الصّديق أنّه يمنح صاحبه الثّبات على الحقّ ، ويوفّر التّوازن لحياة الإنسان ، والإنسان ينفع مجتمعه حينما يكون صادقاً متوازناً ، عادلاً سويّاً مخلصاً لا يتزعزع ، واضحاً لا ينافق .

وبالصّديق صلاح الحياة واستقامتها ، وفلاحها وقوّتها ، ولا تكتمل مروءة الإنسان إلّا بالصّديق والوفاء ، ففي صدق الإنسان إكّرام لنفسه ، وصون لهيبته ، وحفظ لمكانته في المجتمع والحياة .

الكلمة الطّيبة مطيّة الهداية والإصلاح ، وزناد الفكر والفلاح .. إنّها منارة توجيه وإرشاد ، ورافد تعليم وبناء وإعداد . الكلمة الإنسانيّة الغدقة ، والمفردة المخلصة العبقّة ، تنقذ النفوس من أحوال الخمول والجهالة ، وتعتمدها

أجل، لا يعرفون إلا هذا الإنتقاصات الشخصية، في مدّهم النظيفة بجدراها الملونة، وأطفالها المتعلمين في المدارس، الذين لا يكونون، إن مرضوا أو ماتوا، إلا على أسرة المشافي. إن هذه الملهاة مضحكة بالنسبة إليهم، - تجهم طه مشيراً إلى الجبال والسهوب. - يبدو أنه لا بد من نهاية حتمية لهذا الجهل هنا. فهل ثمة حاجة إلى الغاز والمواد الكيميائية والحديد والحواتم؟ هل من المعقول إلقاء ذلك كله فوق رؤوسنا؟

- تنهّد ماك غريغور عميقاً، إجابة على كلام طه.
- ينتصرون ببساطة، - تابع طه. - ولا يتركون شيئاً لنا. يقتلون حتى الشيوخ المرضى! يسحقوننا نكائباً، من جذورنا.

* * *

عرضوا « فرتير » أوبرا مقتبسة من مأساة غوته. كانت جيزي تجلس صامتة إلى جانبه، كما لو أنها انسجمت بمشاعرها كلية مع قصة زواج ألبيرت وشارلوت، الألماني القح، والطائش فرتير. « دع دمي يسيل ». بدأت شارلوت تغني بصوت فرنسي. همست جيزي « إنني أمقت هذه الأشياء. إنها تعذبني » ولددهشة ماك غريغور، سالت دمعان كبيرتان من عينيها وأتلفتا تهرجها.

لبثت جيزي صامتة طوال طريق العودة، فأحس ماك غريغور بلغز هذه المرأة الخفي، المرأة المندفعة بتهور، إلى تواصل حي عبر حاجز وجهها. لم تستأنف جيزي الحديث، إلا عندما بدأت تجهّز القهوة في وسط زجاج مطبخها وبريقه. - كان زواج شارلوت الضيق الأفق ذاك، زواجاً بليداً وتافهاً، - قالت جيزي، وكأنها تبرر بكاءها عند مشاهدة القصة الألمانية. برفقة الموسيقى الفرنسية. - إنني متيقنة من أن هذا بالذات، هو ما أراد غوته التعبير عنه.

- تصوّرت، عند قراءة فرتير، أن غوته يهاجم الحب الرومنسي، وليس الزواج، - حاول ماك غريغور الاعتراض على رأيها.

- لا طبعاً، - قالت جيزي. - فالألمان وغوته ذاته، منسجمون في مواقفهم من الحب.

- قد أكون مخطئاً، - قال ماك غريغور. - ولكن عموماً، كان ذلك الزواج الخيّر، قريباً من روح غوته. أما الحب فلم يثمنه غوته عالياً.

جلس ماك غريغور إلى طاولة نظيفة معقمة، وفكر في أن النظافة البالغة، تبدو إحدى سمات عائلة موزيل العريقة الأصبلة. وتأمل كيف تقوم جيزي في ثوبها الحريري، بأداء دور الخادمة، أداءً دقيقاً ومنظماً: تطحن البن، تملأ الركوة الزجاجية، تنظف وتحمل، وتشعل البوتوغاز... مستغرقة في العمل، كأنها نسيت حضور الضيف.

- لا أعرف موقف غوته من الحب، - قالت أخيراً. - ولكنني أدرك أن الزواج هو الغباء بعينه. لقد تزوجت بعد قصة حب في سن العشرين، ولكن الرجال الفرنسيين يجهلون الملاطفة تماماً. ملاطفاتهم مقرّزة، الأمر الذي أمقته. ففي وسع الشهوة أن تصير حباً أحياناً. يصبح كل شيء، حينئذ، راعاً، ويمتد إلى ما لا نهاية. أما الشهوة، إذا كانت وحدها، فإنها تولد الحقد. لقد ولد في هذا الحقد. هيئتي كلها... مررت يدها على جسمها من الأعلى إلى الأسفل. - أنا ما الذي يختلج في روحي، فلا أحد يعرفه، بمن فيهم زوجي. - إنني امرأة طبيعية، ذات قيافة فرنسية حسنة، أليس كذلك؟ - وانتظرت. كانت تريد جواباً.

- نعم، - أجاب ماك غريغور.

- حاولت أن أحب زوجي حباً هادئاً، ولكنه قتلني بشهوته وشبقه. فليفعل ذلك مع غيري، ولكن ليس معي.

ما الذي يحدث لهم. أجل، إن طه محق، فنحن نتحول إلى شعب مدني، وعلينا بالتالي أن نحارب على الطريقة المدنية.
- أدرك هذا كله.

- ولكن أي أجنبي يدرك هذا، أو في وسعه أن يدرك جوهر الخلافات مستقبلاً؟ كيف بإمكان هذا الفرنسي مثلاً، أن يستوعب ما الذي نبغيه، وبأي مستقبل نحلم.

قلت لطفه عندما سافر إلى باريس: « لم يخلّ أحد منذ الأزل، بقوانين الشرف الكردي، فلا تحطّ من قدر هذا الشرف. »، فأجابني: « شيء مضحك، أن يسمع المرء كلامك ».

كان بودي أن أقول له فقط: إذا جرّدت الكرد من الشرف، فلن يبقى عندنا شيء. فينبغي علينا أن نظل أوفياء لهذا الشرف، في المستقبل أيضاً. كي يتذكر طه ذلك في باريس، فليس في وسع أي فرنسي إدراك هذا الأمر.

- هذا صحيح، - أكد ماك غريغور.

- إنني أعرف بواطن الحياة الجبلية الكثيبة كلها، - قال زاتكو معانقاً الأفق بنظرته. - ولكننا سنفقد كل شيء، إذا لم نحّم جبالنا وقرانا. ولذا أريد أن أقتل هذه الدابة المخصية، العجوز إيلخان. إنه يريد الإجهاز على قضيتنا كلية.

* * *

أعطى طه الأوراق لماك غريغور، فألقى الأخير نظرة سريعة على الصفحات الباهتة لبيانات الشحن، وتعليمات التحميل الصادرة من سلطات المرفأ، لقبطان السفينة اليونانية ألكسندر متاكساس. - سينقلونها إلى إيشيك، المرفأ التركي على البحر الأسود، ومن هناك سيشحنونها إلى إيلخان.

- عبر تركيا؟

- نعم. فهل عرفت الآن من هو الكلب العجوز إيلخان؟ هل قابلت كردياً واحداً، لا يتقرّر من التعامل مع الموظفين الأتراك؟ فصار الأتراك يسمحون لإيلخان، أن يستلم الأسلحة عبر أراضيهم! - يصعب تصديق هذا. حتى عندما يجري الحديث عن إيلخان. هل معلوماتك صحيحة يا طه؟


انتفض الأخير، لمس شاربيه القاسيين. فلم يهدر وقته أبداً في الإفصاح عن مشاعر الشجن، لم يسمح لنفسه بذلك. غير أن الأسى كاد يطفو الآن، ولكنه تمالك نفسه، على الرغم من ذلك، وابتسم ثانية ابتسامة ساخرة قائلاً:

- هل يستطيع الكرد إلزام الصمت؟ إنك لا تعرف هؤلاء الكرد المقيمين في جنيف، إنهم ثلة من الثرثارين الحمقى، الراكضين مثل الكلاب خلف دوباس.

* * *

ألقى طه نظرة على السهول الخرساء، حيث تمتد ظلال الأحجار الكريمة في القمم وتحجب أشعة الشمس.

- هل تعرف يا عم ايوار ما الذي اكتشفته في أوروبا، - سأل طه بعد صمت طويل. - كشف أن الأوروبيين لا يعرفون سوى شكل واحد من أشكال الإضطهاد - الإنتقاص من الحقوق الشخصية.



James Aldridge

فقرات من رواية جيمس أولدرج «الجمال والسلاح»

ترجمة: د. محمد عبدو النجاري

ألقى

ماك غريغور نظرة على كيسبيان، الذي يلتهم بشهية عارمة الفطيرة الأمريكية المشبعة برائحة السيجار. ونؤه:

- ثمة كثيرون غيركم يساندون الثورة الكردية. ولكن السؤال: ما هو هدف مساندتكم؟

- فكر في الهدف الذي يخطر على بالك. فلنفترض أننا نطمع في الغاز وفي النفط والسلطة السياسية هناك، واختر أنت حسب ذوقك. وربما نرغب في استخدام الكرد، من أجل محاصرة العرب أو الروس.

قامت الفتاة بذلك على نحو ممتاز. مع إحسائهم القهوة، بدأ سوروغلو الكلام:

- أعتقد أن بإمكاننا مناقشة مسألتنا مناقشة منطقية. لأنها واضحة بالنسبة إلينا... ليس كما هو الأمر بالنسبة إلى البعض... وهزّ رأسه مشيراً بمرارة إلى جميع محاوره الغير المرئيين، العاجزين عن التعمق في مشاكل تركيا ومصاعبها.

- أين تكمن مشكلتك؟- سأله ماك غريغور.

- كالعادة في مسألة الكرد. فالأخيريون عبء دائم على كاهل تركيا. لعنات أبدية على طريق مستقبلنا، يتركها الأتراك جميعاً، في حين لا يتفهمها الكرد.

- أي تفهم مطلوب منهم؟- سأل ماك غريغور. - لقد عاملتهم معاملة سيئة، وأعتذر، إذا قلت معاملة وحشية.

* * *

جاء ماك غريغور في صباح اليوم التالي، إلى القاضي الذي كان ينتظره في أحد الكهوف، مرتدياً ثوباً نظيفاً وعمامة نظيفة.

- الآن أبلغنا بالذي يجري هناك في باريس،- قال علي العراقي. - لقد باتت المسألة معقدة، أليس كذلك؟

- سأروي لكم ما يحدث، وأحكموا بأنفسكم،- قال ماك غريغور. - وبدأ يحكي بالتفصيل، كل ما قام به في أوروبا. كان علي والقاضي يصغيان إليه، جالسين إلى الطاولة، صامتين صمتاً قلقاً. ولكن القاضي لم يستطع، في نهاية حديث ماك غريغور، إخفاء دهشته وحيرته. فقال:

- إنها سلسلة من التناقضات، اشرح لنا، من فضلك، ماذا يعني هذا كله في الغرب.

- ليس من السهل حلّ العقدة، فقد أبدت حكومات الغرب،

إهتماماً مفاجئاً بمستقبل الكرد، وكلها مستعدة للتدخل.

- هذا ليس شيئاً جديداً،- قال علي العراقي متجهماً.

- صحيح، ولكنهم يتبنون، لأول مرة، فكرة الحكم الذاتي للكرد، بل وفكرة استقلال القومية الكردية، تبنياً جاداً. وهذا شيء جديد تماماً.

- هذا يعني أننا نحقق نجاحات،- قال القاضي. - ولكن أين تكمن صعوبة المشكلة إذا؟ فلماذا لا يمدون لنا يد العون، ولا يسمحون لنا بإمتلاك الأسلحة؟

تأسف ماك غريغور، لعدم قدرته على تقديم تفسيرات أفضل، تفسيرات بدت جلية في أوروبا، ولكنها غامضة غريبة فوق الجبال. اصطحبت امرأتان كرديتان في الصباح، طفلاً مريضاً إلى شرام، لأنهما اعتقدتا أنه طبيب أجنبي (ما دمت أجنبياً يعني أنك طبيب، حسب رأيهما). أخذ الفرنسي يفسّر لهما متأسفاً أنه ليس طبيباً، ولا يستطيع مساعدتهما. فبصقتا غاضبتين وشتمتا شتائم مقدعة...

- تكمن صعوبة المشكلة،- ردّ ماك غريغور، متكئاً على الطاولة المغبرة. - في أنهم سيتبنون فكرة الثورة الكردية، في حال واحدة فقط: إذا استطاعوا إستغلالها.

- بأية وسيلة؟

- بمختلف الوسائل: بمساعدة المال والسلاح، أو الوعود أو الدسائس السياسية، والرؤى. بكل السبل، التي تحقق لهم ما يسعون إليه. يكتفي الفرنسيون كما يبدو، بالمكاسب التجارية البحتة من النفط والغاز، لذا قرّرت أنهم أفضل من الآخرين بالنسبة إلينا.

- هل الفرنسيون نزيهون؟- سأل القاضي.

- كيف تسأل مثل هذا السؤال أيها القاضي؟- قال ماك غريغور بسخرية حزينة. - الفرنسيون أضعف من الآخرين، هذا هو سرّ المشكلة.

- من الصعب فهم طبيعة تفكير الأوروبيين،- علّق القاضي بكرب.

- تتغير أوروبا بسرعة،- قال ماك غريغور. - كان يسهل عليهم، فيما مضى، إخضاع الجميع بمساعدة قاذفات القنابل والجيش. أما الآن، فبات الأمر معقداً. إضافة إلى أن أجواء بلدانهم تتهدّد بهزات سياسية كبيرة.

* * *

- أعرف، أعرف،- ردّد ماك غريغور. - فلا بد من هذه التحولات، إلا أننا الآن بصدد مشاكل أخرى.

- لماذا لا بد منها؟- سأل زاتكو بإستياء. - ما الحاجة إليها؟ أمن أجل محو الفرق بين الشتاء والصيف، مثلما هو الأمر الآن في أبريل؟ هل تشعر كيف تتغير؟ اذهب الآن وناقش الموضوع مع الفرنسي، فلا يدرك الكرد أنفسهم،

ZAHÎD XELEF:

"Ez helbestê di gerdena hêvîyê de dirêsim dema ku xwe davêje tora hestê min da ku jîyan di xelesa berdewamîyê re bizîvire"

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv



Helbestvan Zahîd Mehmûd Xelef di sala 1967an de, li gundê Sîhaya piçûk yê ku li başûrê Tirbespiyê dikeve ji dayik bûye. Ew parêzer e û karê parêzerîyê jî dike, helbest û gotarê dinivîse. Aniha li bajarê Qamişloyê rûdinê

-Çîroka we û nivîsandinê kengî û çawa destpêkir, der barê wan destpêkan de hûn çî dikarin ji me re bibêjin ?

-Tiştêkî balkêş e ku te bi Çîrokê ezmûna min da naskirin, ev yek cihê dilxweşiyê ye, ez te sipasdikim. Ji ber ku destpêka rahiştina min ji tîpên Kurdî re weke xewnekê bû ,çîrokeke xemgîn bû, lê serkeftî bû .

Tê bîra min berî sala 1990 î di temenê hijdeh û nozdeh saliya min de dema ez li Qamişlo di refa deh û yazdehan de bûm, ez carekê hatim vexwendin ji bo pêşangiheke pirtûkan ji laî hin hevalan ve.

Bi dizî û êvarê ,li wê pêşangehê min pirtûka rêzimana kurdî bi dest xist û ez hemî bûm eşq û evîna zimanê xwe, tevî zilm û qedexekirinê, û berdewam min xwe hînî tîpên Kurdî dikir bê westan, lê hinga tiştin wek helbestan bi zimanê erebî min dinivîsandin ta sala 1990î dema ku min dset bi nivîsandina helbestan kir bi zimanê Kurdî ,êdî ji min re bû hezkirinek û amancek ku Rojek bê ez Pirtûkek yan jî Dîwanekê bi zimanê xwe ragihînim tevî rewşa me kurdan a zehmet û qedexekirina zimanê me.

-Helbest ji bo we çî wateyê dide ?

Helbest xeml e, daristaneke pevgirtî ye, sîberekî perî dirêj e dildaran hembêz dike. Ji demên herî bûrî ve çaxa Cizerî û Herîrî û Nalî û Xanî helbest dihunandin êşa xwe a ku weke perengên sor di hinavê xwe de derdikirin yan jî şahî û sema di

dilê xwe de rizgardikirin, ew helbest hembêza sivikkirina xem û derdan bû yan jî Ragihandina helwesteke niştimanperwerîyê bû .

Vêce bi min helbest tabloyek bi tevger e, pirreng e , ji giyanê jiyanê û mirovahiyê hatiye darizandin û weke min di dîwana xwe a bi navê Awazên dildar de bi watekirî ,helbest hilma zaroka li ser şîr hînî hezkirinê dibe ,eve helbest.

-Helbestvan ji kê re helbestan dihûne ?

Ez helbestê di gerdena hêviyê de dirêsim dema ku xwe davêjê tora hestê min da ku jiyan di xeleka berdewmiyê re bizîvire , ji ber ku pêwîste mirov derfetên çakkirina pêşeroja xwe peydabikê da ku karibê rûbrûyî xem û kovanan û zehmetiya jiyanê bibê, lewma ew hêvî bê goman diyarî hezkirinê dibê , dil xweşdike, canê xwîner û helbestvan nûdikê, Helbest û hêvî û hezkirin jev cuda nabin.

-Helbest dikare çi bandorê bike ?

Heger em werin li bandora helbesta Kurdî bipirsin divabê li dîroka hunandin û dariştina Hemî serpêhatiyên gelê Kurd bigerin, hinga wê bê xuyanîkirin ku helbesta Kurdî ji Roja hebûna kurdan ve rahiştiye barê parastina wêjeya kurdan , bi wateya hilandin û veguhestina kultur û filoklorê me ta çîrok û çîvanokan ,dastan û berxwedaniya man û nemanê û herwiha hezkirinê keç û lawên kurdan wekî Mem û zîn, zembîl firoş û serhildsna kelha Dimdim û eve roleke pir giring bû û serkeftî bû .

Îro roj zelale ev rola hanê hîn berdewam e xwedî teybetmendî ye bi zarekî em dikarin bêjin ku wêrek e dest davêjê hemî rûdanan û radigihînê, lê helbest nemaye cûreya

bi tenê ji ber ku cîrok û roman û lêkolîn ji li cem kurdan peyda dibe ,rewş bi hêvî ye.

-Di navbera helbesta tirazû û helbesta nûjen de, hûn hezdirin kîjan şîwazê bêtir bi kar bînin û bo çi ?

Pirsa te giring e ,ez bi xwe helbesta nûjen dibijêrim bi şewazê azad dinîvisênim guhdidim wêneyên helbestî û mûzîkê, û helbesta min lihevhatiye û Di heman demê de carcarna ez helbesta bi movik ji dinîvisênim .ez bi xwe pir hez kilasîk dikim û li ser avadikim jê sûdê werdigirim ew dimîne bingiha helbesta Kurdî ,lê îro roj helbesta nûjen jî gavên baş davêje.

-Jixwe hûn helbestê bi zimanê kurdî, hem jî bi zimanê erebî dinivîsin, bi dîtina we çi têkilî di navbera ziman û helbestê de heye, kengî bi kurdî û kengî bi erebî hûn dinivîsin ?

Erê weke te amajekir ez bi herdû zimanan dinîvisênim.

Di behweriya min de dema ku bi erebî jî binîvisênim dîse Kurdî ye ji ber naveroka helbesta min a erebî , şahiyek , hestek, êşek yan jî hêviyeke kurdî ye. û heger hin bêjin çima tu bi erebî tîpan dikişîne bersiva min wê bi vî awayî be : Min weke mirovekî kurd zimanê dayika xwe bi dest xist û ez biserketim xwendin û nîvisandin ,tevlî hemî zext û nîrê qedexekirinê û ev cihê dilxweşiya min e .

A din :Bi şewekî fermî em fêrî zimanê erebî bûn di Dibistanê dewletê de ,me kurdan dixwest zanîn û zanistiyê bi dest bixin ta ez bi xwe weke xortekî kurd bûm parêzer , lewma dema min Alav û karîn hene ezê afirandinê bi erebî jî bikim ,çima na.

-Têzanîn ku hûn gotarê jî dinivîsin, der barê ezmûna we di vî warî de hûn çi dikarin ji me re bibêjin?

Dikarim bêjim ku dema tu bibijêrî ji xwe re ku tu xwedî pênûs bî û di civaka xwe de bi rol û bandor bî,Wê demê tûyê rûbirûyê sitûbarîya erkekî bibî ku te bixweneqandiye.

vêce çi bûyer yan pêkdan çêbibin divabê xwe ên Kurdî ,helbest bi helbest xwe nû tu rahêjê, şîrovebikî, helwest zelal bî , ew dikin ,ez bixwe bi hêvî me û geşbîn im , bûyer êş be , şikestin be an serkeftin be.

-Berhemên heya niha çi hene?

Lewma min jî ev erk li gor derfeta xwe pêkanî di riya gotara xwe re û piranî bi zimanê Kurdî. tê bîra min di kovara welat de berî du salan mijara Girêbesta Civakî min şîrovekir û berî wê çîroka xwepêşandan jî dîse di welat de min belavkir bi alîkariya nemir dîlovaniya xwedê li giyanê wî be DiljarSeyda û her wiha çend gotarên siyasî civakî û Yasayî di Rojnameya Bûyer de û hin malperan , û ez berdewam dikim helbest û wekî din.

1_Perav û Dil

2_Awazên Dildar

3_Sawa Evînê

4_Eşwaq La dîfafa leha bi zimanê Erebiye

-Hûn rewşa helbesta kurdî ya îronî çawa dinirxînin ?

Ji bo siberojê hêviyên min hene ku ez berdewam bim di xidmeta wêjeya Kurdî de pêûsa min nawestehê.

-Gotina we ya dawî....?

Dîtina min ji rewşa heyî re baş e, helbest gav bi gav bi pêşve diçe ,tevlî kêmasî û zehmetiyan derfet heye ku em xwe biwestînin û serkeftineke baş bi dest bixin xuyanîdike ku hijmarek baş jî Helbestvanên me guhdidin nivîsandinên

Di dawî de ez sipasiya te dikim kekê imran û serkeftinê ji kovara Welat re dixwazim bi hêvî me bimîne navnîşana peyva Azad. ■



EBDULA GORAN

(1904 - 1962)

Serkêşê helbesta kurdî ya nûjen e.

Di sala 1904an de, li şarê Helebçayê, li başûrî Kurdistanê, Ebdula Goran ji dayik dibe.

Xwendina xwe ya seretayî li dibistana Helebçayê kuta dike. Di sala 1921an de li Kerkûkê dikeve dibistana mamosteyan, lê ji ber belengazîyê û rewşa abûrî neçar dibe ku dev ji xwendinê berde, û xwendina xwe nagihîne serî. Ji sala 1921 heya sala 1925 di rewşeke abûrî pir xerab re derbas dibe.

Diwazdeh salan li şarê Helebçayê wekî mamoste dixebite û dersan dide. Bi xwe, xwe fêrî zimanên Tirkî, Erebi, Farisî û Ingilîzî dike û pirtûkên pêşverû bi zimanê tirkî û ingilîzî dixwîne.


Di sala 1937an de, di wîzareta çûnûhatinê de dixebite û di vê demê de dest bi nivîsa helbestê dike û çend helbestên bilind, hêja û balkêş dinivîse, ji wan helbesta (Geştek li Qeredaxê) û helbesta (Geştek li Hewremanê).

Ji sala 1940 heya sala 1945an li bajarê Yafayê di radyoya Rohilata Jêrîn de dixebite.

Ji ber xebata wî ya şoreşgerî û helwestên wî yên pêşverû gelek caran tê girtin û zindankirin.

Di sala 1951an de li Silêmanîyê karê rojnamegerîyê dike û du salan sernivîsertîya Rojnameya Jîn dike.

Ji ber çalakîyên wî bi girûpa Alîgirên Aştîyê re, Goran ji alî desthilatdarîya Îraqê tê girtin û ji zindanekê wî vediguhêzin zindanekê. Di sala 1956an de ji zindanê serbest tê berdan û berê xwe dide Bexdayê. Li wir di kompanîyeke avakirinê de wek çavdêrê li ser karkeran dixebite, lê ew di wî karî de pir dirêj nake, û ji ber beşdarîya wî di xwepêşandanekê de cardin ji alî desthilatdarîyê vet ê girtin û sê sal zindan



lê dibirin.

Di 14ê tîrmeha 1958an de û di encamê şoreşa 14ê tîrmehê de hemû girtîyên siyasî hatin berdan, ew jî di nav wan de bûye.

Piştî ku ji zindanê derdikeve, Goran cardin li çalakîyên xwe yên çandeyî û siyasî vedigere.

Di sala 1961ê de li Bexdayê rêz jê re tê girtin û li zangoya Bexdê beşê wêjeyê dibe mamostayê wêjeya kurdî û rexneya wêjeyî, di heman demê de jî ew di komîteya sernivîser ya rojnameya Azadî ya Kurdî de endam bûye.

Di sala 1962an de wek endamê komîteya (Şewra aştiya hemû cîhanê) tê bijartin.

Di 18-11-1962an de û ji ber nexweşîya penceşêrê, Goran koça dawî dike.

Goran gelek berhemên hêja û bi nirx li dû xwe hiştin. Ji bilî helbestên wî ku şoreşek di helbesta kurdî de afirandin, gelek çîrok, serpêhatî, werger û nivîsên din jî hene.

Komela nivîserên kurd berhemên Goran di du berhevokan de çapkirine, yek ji wan helbestên wî ne, ya din jî nivîsên wî yên bexşane ne. ■



SÛKA FATORE KEVINTIRÎN SÛK LI AMÛDÊ YE

Efsan Kurdî

Bajarê Amûdê kevintirîn bajar li parêzgeha Hesekê ye, piraniya neştasihên wî kurd in, û ew bi ser navçeya Qamişloyê ve ye, dora 30 kîlometran Rojavayî Qamişloyê û 80 kîlometran Bakur û Rohilatî Hisîçayê dikeve.

Deverên herî navdar û kevnare li bajarê Amûdê evin: (Girê Şermola, Sînema şewitî, gola Enter) li kêleka van kevnecihan bazareke herî kevnar heye ku ew jî bazara fatore ye.

Xiristîyanên Amûdê xwedan destpêşxerîyê bûn di avakirina bazara fatore de.

Behcet Şêx Bekir yek ji bazarganên vê sûkê ye, û dikanek wî ya cil û bergan têde heye, der barê vê bazarê de ew ji kovara Welat re axivî û got:

Di despêka xwe de Amûdê mîna gundekî mezin bû û ew kevintirîn bajar li deverê dihat naskirin, piraniya xelkê wî kurd bûn, lê piştî koçberiya xiristîyanan ji Tirkîyê ber bi binxetê ve gelek malbatên xiristîyan li Amûdê bi cî bûn, û di avakirina sûka fatore de bûn alîkar.

Şêx Bekir dibêje ku ev bazar di sala 1937 hat avakirin, ew jî du rêz dikanên ku li kêleka hev hatine avakirin pêktê, li gorî zaniyariên min, ên ku ev bazar avakir hin malbatên amûdî bûn mîna malbata Şêx Bekir, mala Emo, Gunreş û hin malbatên xiristîyan.

Navê vê sûkê bû sûka fatore ji ber piraniya dikanên wê caw difirotin, çi herîr û çi cûx ji xwe navê caw bi kurdî fatore ye.

Tevî ku rêjîm navê vê sûkê guhert û navê alwehde lêkir lê ev sûk li ser zmanê xelkê ma bi navê fatore.

Bekir diyar kir ku di heman salê de ev sûk hat şewitandin ji ber topbaraneke firensî û yek ji wan dikanên ku şewitîn ya min bû.

Xiristîyanên xwediyê hin dikanan di vê sûkê de koçber bûn dervî welat, gelek ji wan dikanên xwe bi kirê an firoxî dane û ta roja îro dikanên wan di destê kirêçîyan de ne.

Xelîl bavê Ridwan terzîvan e, ji kevin de li vê sûkê dixebite.

Xelîl behsa vê yekê dike ku gelek hevalên wî yên di vê sûkê de dixebitîn hebûn, û ew wek malbatekê bûn, lê niha ji wan çend kes tenê mane, hinek ji wan çûne ber dîlovaniya xwedê û hinek din bi temenê xwe mezin bûne û li malê dimînin, û niha zarokên wan li dikanên wan rûdinên û kar dikin, heya bi reng û dîkorên wan jî hatine guhertin. ■



FERHENGOK

taqî	اختبار
serborî	تجربة
ezmûn	امتحان
rade	درجة
ast	مستوى
raje	نسبة
pile	علامة
asoyî	أفقي
stûnî	عمودي
goşe	زاوية
hevêrke	دائرة
cemser	قطب
Kişwer-parzemîn	قارة
eşkêl	قطر الدائرة أو الأشكال الهندسية
kenar	ضلع
çargoşe	مربع
sêgoşe	مثلث
qebare	حجم
firehî	مساحة
bîrkarî	رياضيات



LI QAMIŞLOYÊ, SÊYEMÎN PÊŞANGEHA HEREKOL YA PIRTÛKAN LI DAR KET

Ziyad Ehmed Hisên



Civak dixwîne civaka bi pêş dikeve, lê hetanî civak bixwîne û bi pêş bikeve, pêwîstî pê heye ku atmosferek jê re peyda bibe, her wiha leheng û qehreman jî gerek in da ku felqên deriyê xwendinê ji gelê xwe re vekin. Îcar li rojavayê Kurdistanê piştî çend mehan ku mîrxas û gernasana çîroka Daişê ya tarî bi dawî kir û axa welatê xwe ji qirêjiya pêxwasan helal kirin, atmosfer peyda bû û lehengean jî giyanên xwe ji bo gelê xwe gorî kir û êdî dor hat li ser aliyên çandî û rewşenbîrî da ku ew jî gavên xwe biavêjin.

Li bajarê Qamişloyê Herekol careke din baxçikê xwe yê pirtûkan li Hela Zanayê raxist:

Bi serpereştiya Desteya Çand û Hunerê ya Herêma Cizîrê Sêyemîn Pêşangeha Herekol ya Pirtûkan bi diruşmeya **“Civak dixwîne civak bi pêş dikeve”** di 22yê tîrmeha 2019an de li dar ket. Vê pêşangehê ji dîroka 20.7.2019an hetanî 25.7.2019an anku li ser dirêjahiya 6 rojan pirtûkên cihêreng ji wêje, çand, dîrok, siyaseta, reşwenbîrî û hwd ku zêdeyî 8600 serenavî û bêhtirî 112000 pirtûkî bû, li xwe kom kirin û raberî dibijiyên xwe kir. Jixwe pêşangehê navê xwe ji nasnavê nivîskar Hisên Çawîş “Herekol” girtiye û weke ku hevserokê Desteya Çand û Hunerê Ebdo Mixso ku yek ji endamên komîteya amadekar bû, diyar kir, armanca vê pêşangehê ew bû ku civak xwe bi xwendinê bi pêş bixe.

Di vê pêşangehê de 43 dezgehên rewşenbîrî, weşanxane, pirtûkxane û nivîskaran di nav de çend weşanxane ji bakurê Kurdistanê (Sîtav, J&J, Avesta, Nûbihar, Peywend û Dara) û yek jî ji Başûr (Endîşe) cihê xwe di vê pêşangehê

de girt. Li gor ku berpirsa ragihandinê di Desteya Çand û Hunerê de Leylan Cemal da xuyakirin, hin weşanxane ji Şamê jî di pêşangehê de beşdar bûbûn. Pirtûkên pêşangehê bi 6 zimanan bûn (kurdî, erebî, siryanî, tirkî, îngilîzî, fransî); zimanê erebî yê serdest bû di şûn de yê kurdî dihat, lê rêjeya zimanên wekeî siryanî, tirkî û hwd pir kêmtir bû.

Jixwe li gor bernameya pêşangehê deriyê firotina pirtûkan di dema nîvro de (ji 1 hetanî 5), her wiha di dema êvarî de (piştî 9) dihat girtin, lê belê derî ji lidarxistina semînerên cihêwaz re di navbera nîvro de û di dema êvarî de jî ji maseyên guftûgoyên wêjeyî, çandî û zimannasiyê re dihat vekirin.

Pêşangeha Herekol cihekî başqê ji bo pêşandana keval û wêneyên şewekarî veqetandibû. Vê pêşangeha wêneyan hin şewekarên Rojava bi berhemên wan yê şewekarî yê cuda hêwirandin.

Tiştê balkêş ew bû ku serdêrên pêşangehê tevî ku pir bûn lê kirîna wan ji pirtûkan re kêmtir bû. Pirtûk bi piranî ji hêla saziyên Rêveberiya Xweser ve dihatin kirîn. Behaneya serdêran ku çiman zêde pirtûkan nakirin ew bû ku dilê wan dibije pirtûkên bi zimanê kurdî lê nîrxê wan li hember yê erebî pir giran e, loma ji destê wan nayê ku rahêjin hejmareke zêde ji pirtûkan û tenê kirîna pirtûkek yan du pirtûkên buhasivik bes dikin, behaneya weşanxaneyan jî ji bo nîrxê giran yê pirtûkan ew bû ku anîna pirtûkên kurdî ji derveyî Rojava lêçûneke zêde pêwîst dike.

Pêşangeha îsal li gor ku komîteya amadekar da xuyakirin ji her duyên derbasbûyî dewlemendtir û zengîntir bû, li gor komîteyê sedem ew bû ku Dergehê Sêmalkayê ji ber arîşeyên siyasî girtî bû. Jixwe li gor ku şopîner û serdêran jî da xuyakirin pêşangeha îsal hejmareke mezin ji pirtûkên pirreng, her wiha weşanxane û dezgehên cuda ku ji derveyî welêt daketibûn di hundirê xwe de girtibûn. Pêşketina ku di pêşangeha îsal de çêbû, bê guman dide xuyakirin ku dê di salên bê de bi awayekî biserkeftî li dar bikeve.

عرائس القامشلي

بين الذهب

والذهب البديل

تقرير مريم تمر



تزيين

علم الاجتماع، يعمل في بيع الذهب البديل أو ما يسمى بالذهب (البرازيلي). أكد لنا أنه بعد الأزمة السورية وغلاء الذهب و بسبب جودة الذهب البرازيلي لكونه أطول عمراً من الذهب الروسي أو الهندي جعل الاقبال على شراءه من قبل الناس أكثر .

وتابع إسماعيل: هذا الذهب من صنع الصين إلا أن تجار دمشق أطلقوا عليه هذه التسمية لعدم قبول البضاعة الصينية، إذ أصبح هذا الذهب بديلاً للذهب الحقيقي .

فكثير من العرائس يشتري قطعاً أو قطعتين من الذهب الحقيقي ويكملن باقي المصاغ من هنا، وبعضهن يشتري الذهب كله من عندنا. والكثيرين من الزبائن يقولون أن سعر الخاتم البرازيلي أصبح كسعر خاتم الذهب قبل الأزمة. حيث قد يصل ثمن الطقم إلى (٢٠) ألف وأكثر.

وأكد لنا إسماعيل أنه في كل محل للاكسسوارات هناك ركن للذهب البرازيلي .

وعن المصاعب التي يواجهونها في جلب البضاعة قال إسماعيل:

غالباً تكون القطعة مختلفة لأننا نختارها عبر الانترنت، ومصاريف الشحن أصبحت مكلفة وخصوصاً الجوي منه.

وواصل رافع مبتسماً كلما زاد الذهب غلاء يزداد المبيع لدينا، أحياناً ندعو الله أن يرتفع، أنا (صائغ الفقراء).

عرائس القامشلي بين الذهب والذهب البديل

تقول يارا: كانت صدمتي كبيرة عندما اكتشفت أن الذهب الذي لبسته في عرسي كان تقليداً، أحسست أنني مخدوعة، ولكن لأبأس.

تابعت كلامها مع طلبها أن لا أسجل صوتها: أعلم أن الأوضاع صعبة ولكن ما كان علي زوجي أن يكذب علي بهذا الشأن.

«جميلة» فتاة في العشرين مقبلة على الزواج ترى أن شراء الذهب بالنسبة لها شيء كمالي يمكن الاستغناء عنه، وهي سعيدة بالذهب البرازيلي الذي قدمه لها خطيبها.

ما يهمها الآن أن تصل إليه في إقليم كردستان العراق حيث يعمل هناك .

في ظل سنوات الأزمة و تحت ضغط الأعراف الاجتماعية المتعارفة لدى أهالي المنطقة في تقاليد الزواج، أصبح شراء الذهب حملاً يتنقل كاهل العريس، وحلم

قد لا تستطيع الكثيرات من المتزوجات حديثاً أن تتلنه.

إنها ليست العقبة الوحيدة التي تواجه من يعيش في هذه المدينة بل أنها المشكلة الأقل تأثيراً في الحياة اليومية أمام سيل المتطلبات اليومية التي يواجهها

المواطن في ظل الاختناق الاقتصادي لأغلبية العوائل في المنطقة ■

العروس بالذهب من أقدم العادات والتقاليد لدى مختلف الشعوب و هو عرف اجتماعي متداول لدى سكان منطقة الجزيرة .وهذا ما يميز مدينة القامشلي التي تقع في شمال شرق سوريا، يختلف مكوناتها من عرب وكرد وسريان ولكل منهم عادات وتقاليد خاصة في الأفراح والأتراح . ارتفاع سعر الذهب في سنوات الأزمة كان ملحوظاً، إذ وصل في بعض الأشهر إلى (25) ألف ليرة سورية . ليكون أضعافاً مضاعفة عما كان عليه قبل الأزمة التي تمر بها المنطقة.

قلة الذهب في الأسواق

في وسط المدينة سوق خاص بالصاغة يسمى "سوق الذهب" وفيه التقينا بالحاج عبد الغفور الذي يعمل في هذه المهنة منذ بداية التسعينات.

وأوضح أن ارتفاع ثمن الذهب يعود إلى ارتفاع ثمن أونصة الذهب عالمياً

لكثرة الطلب عليه، وهبوط العملة السورية مقارنة بالدولار بعد سنوات الأزمة.

وأضاف الحاج عبد الغفور أنه في فترات معينة لا يدخل الذهب إلى المدينة كما حصل قبل فترة.

وأن الآلية المتبعة هي مقايضة الذهب بالذهب، بأن نرسل خمسة كيلو ذهب (خردة) لمطار دمشق وتأخذ الكمية نفسها، التعامل هو كأن تتعامل مع دولة مجاورة لامع مدينة في الدولة ذاتها والمادة كانت متوفرة ونشترها بالعملة النقدية من دمشق وحلب قبل الأزمة.

وأردف : قبل الأزمة كانت المادة متوفرة ونشترها بالعملة النقدية من دمشق وحلب، وكان الذهب الذي يصل إلى مدينة القامشلي يذهب جزء منه إلى المدن الأخرى، كدير كركي لكي وعامودا والحسكة .


و أضاف الحاج: قلة البيع له التأثير المباشر على قلة الذهب في السوق فالأهالي يشترون الذهب لحفظ أموالهم فيه إذ يجدون فيه ملاذاً آمناً في ظل انهيار الليرة السورية وعدم استقرار العملة.

الصائغ محمد خير الذي مارس المهنة بعد الأزمة السورية أكد لنا: أن ربح الصائغ في الغرام الواحد لا يتجاوز أكثر من (٤٠٠-٥٠٠) ل.س. وأن شراء الذهب قليل جداً وفي حالات الزواج العروس لا تشتري أكثر من قطعتين هي عبارة عن (خاتم خطبة وحلق).

صائغ الفقراء

رافع إسماعيل شاب يعيش في مدينة القامشلي حاصل على دبلوم في

PÊNC HELBESTÊN RAINER MARIA RILKE



Werger: Şêrko Dakorî

18

Jiyana xwe bi cergeyine ku fireh dibin dijîm

Jiyana xwe bi cergeyine ku fireh dibin dijîm
û di ser hemû tiştên dinyayê re derbas dibin.
Belkî ez nikaribim a dawî temam bikim,
Lê, bizava min dê ev be.

Li dora yezdan, li dora bircê kevnare ez digirim
bi hezarên salan digirim;
û hîn ez nizanim ku ez eyloyek im,
bahozek im, an stranek gewre me.

Sonêtên Orfiyus, XXI

Buhar vegeyiraye.
Erd mîna zarokekê ye ku gellek helbest jiber kirine;

gellek Bi westana vê fêrbûna dûdirêj, ew xelatê werdigire.

Esehîdar bû mamostê wê.
Me ji sipîbûna di riya vî pîremêrî de hez dikir.
Anha, gava em ji wê bipirsîn tiştê kesk û yê şîn çi ne: ew dizane, ew dizane!

Erdê, tu derketiye pişûyê û tu bikêfî,
de îcar bi zarokan re bilîze.
Em dixwazin bigihên te, erda bicoş. Ê herî kêfxweş wê bi ser keve.

Ew tiştên pirr ên mamoste ew fêr kirine,
û yên çapkirî di bistî û rehên kûr
û zehmet de, ew distirê, ew distirê!

Sonêtên Orfiyus, XIX

Tevî ku dinya herdem şeweyê xwe diguhêre bi lez wek ewrekî, dîsa, tiştê ku tê verastandin vedigere cihê xwe di yê Kevnar de.

Di ser guhertin û bihurînê re, mestir û azadtir, strana te ya sermedî difire, yezdanê xwediyê lîrê.

Ti carî kes xwedî li kovanê derneketiye,
ti carî evîn nehatiye fêrkin,
û tiştê me nepend dike di mirinê de,

Xuya nake.
Tenê strana li seranserî erdê pîroz dike û sarêj dike.

Payiz

Pelên daran diweşin, wek ku ji cihekî dûr bikevin,
wek ku gulistanine dûr diçilmisin li ezmanan;
ew diweşin bi dêmine mandelker.

Û bi şevê erda giran jî dikeve,
ji stêran dikeve tenêbûne.

Em tevde dikevin. Ev destê min dikeve.
Û ji xwe re li yê din binere: her tişt wiha dibe.

Lê cardî Yek heye ku bi dilovaniyeke bêdawî radihêje vê ketinê bi destên xwe. ■

* * *

*Rainer Maria Rilke (1875-1926)
helbestvan û romannivîsekî
Bohîmî-Nemsawî bû ku ji
helbestvanên herî mezin di
sedsala bîstan de tê jimartin.
Rilke naskirî ye bi helbestên xwe
yên lîrîk, bi mijarên xwe yên
mêtafizîkî, û bi bikaranîna gellek
simbolên helbestî.*



«حب و حرب» نصوص شعرية

فيروز رشك

كما أن الغد لن يأتي.
أراني في فغ الانتظار والقصيدة .

هو مهرجانك إذا
قلتها
كما

أهماتنا الجميلات
احتفظن في حقائب قديمة
بأوجاع مضغناها حين انتهينا من ست وأربعين حكاية
صديقاتي الخمس
تنازلن للقدر عن أحلامهن
ماتت إحداهن قهرا وطار الحمام من عشها
الثانية لا تزال تهندس حديقة أبيها الراحل
وقد سمت إحدى الشجيرات .
أشتاقك في هديل احتراقي.
الثالثة ملت شوارع الصقيع

باحثة عن شبيه صديقها ذي العمر القصير.
شيرين

غيرت اسمها بعد الحرب
قالت: إن مرارة الوقت قد سكنت الأساء أيضا.
الخامسة

في مدينة حدودية
تحني جديلتها كلما أخطأت قذيفة بيتها
تحفظ بقايا قلبها المسلوب وزهرتين
وأنا
أفتح كل ليلة حقيبة أمي

أنظر لمرآتي
أرانا

قصائد وماء. ■

أمي تعشق عامودا كثيرا
ترش على وجه الطريق إليها صنوبرا وسكر.
تكبر الحريق بعشر شموع
تعرف البئر وأخوة يوسف
تتوضأ حين تحدثنا
عن الحمام المحترق

والهاربين من أوجاعهم إلى عد نقاط الضوء المتجمد في طريق العودة
أمي

لا تقرأ الشعر
لكنها تبكي كلما سمعت
(ليس للكردي إلا الريح)
لا زالت ترتب أحلامنا
بهدهوء كما كانت ترتب أسرتنا
أسرتنا التي بعثرتها الحرب
لا زالت
تؤمن بأن القابلات اللواتي قطعن حبالنا السرية
ربطتنا بهذا التراب .
المدن الكبرى لا تغريني
لم أزرع ذكرياتي في شوارعها يوما.

.....
لا أعشق الأصوات من زجاج
تأسرني الصرخة

.....
لا أشتي ركوب الطائرة
أذوق شكل الحجارة
على جانبي سكة القطار
وكتاب ينام بين يدي الأغنام وقد نسيت خوفها من ذئب ما.
العصافير
و خيمة وطن حر

.....
لا أشكو فوبيا الأماكن العالية فأبي سليل الجبل

.....
أحبك أيها الفلاح
يدي المجنونة لا زالت تنزف منذ زمن
تخط حكايا بيتنا الريفي وزرعنا المحترق.
أعشقك الليلة



Li Qamişloyê, Sêyemîn Pêşangeha Herekol ya Pirtûkan li dar ket



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



ولات: مجله شهرية ثقافية عامة

العدد (٦٥) ٢٠١٩/٨/١ م